

Li Ser “Ziman”ê Witgenstein -2-

Adnan Fırat

“Tractatus di mistîkê de diqedê”

Pierre Hadot

Li gorî Wittgenstein ew filozofê dawî bû û tiştê ewî danîbû ser felsefê û pê ve êdî tu tiştêkî girîng nemabû. Xwest ku hemû pîrsgirêkan bêxe nava mantiqê, dawiya felsefê bîne, ji bo vî jî du ceribandîna mezîna û ji hev hinek cihê pêk anî, lê belê paşî dît ku ev helwest ewqas ne hêsan e.

Ewqas li pey mîsogeriyê û wateyê bû ku, Russel ji bo wî digot “mîrov hêsta “yan fêhmîkirin yan jî mirin”ê jê digirt”(Strathern, 1998:12). Ewî dixwest ku felsefê ji nava tevliheviyê derxe, wek aksiyomên matematîkê formulîze bike, serarast bike, ji spekulasyonên bêfeydê xalî bike û runîna ser qada herî zexm: Mantiq. Jixwe ew bixwe, ji meraq û pêdiviyên xwe yê li ser mantiqê û matematîkê derbasî felsefê bûbû û xwestibû metoda van herdu qadan dagire ser felsefê jî. Pîrsgirêkên felsefê ji xwe re wekî mesela mayîn û nemayînê pejirand.

Wittgenstein, ji ber ku qada felsefê –ku li gorî wî felsefe hinek metafîzîk e û hinek jî mantiq e- dabû ber qada mantiqê –ku mantiq bi tevahî li ser jêdaranînan pêk hatiye- xwe xistibû bin barekî giran. Lewre divabû ku metafîzîk têteta nava qadeke formel ku jêdaranînan wê me bigihanda encamên mîsoger, lê belê ev yek birra jî tiştêkî zahf zehmet bû.

Ewî dixwest ku bingehên mantiqê jî nû bike, cihekî taybet ji mantiqê re çêke. Û wekî embrîyoyekê çawa di nava organîzmayên zindî de wekî destpêk û bingeh in, mantiq jî ji bo felsefeya xwe wisa kire wekî destpêk. Bingeha mantiqê jî rapeyv in û herwiha lazîm bû ku ev rapeyv, ji bo me bigihînin

rastıyan, bihatana dehurandin. Lewre qada mantiqê tenê bi serê xwe pirsgirêkên felsefê bi awayekî şareza çareser nedikir û di heman demî de disiplinên ku di nava felsefê de hatine ceribandin jî, hema bêjin bi tevahî wek spekulasyonên metafizîk dihatin xuya û me nikaribû wan li mantiqê bar bikira.

Li gorî biyogarfikerên wî, piştî ku ewî *Kurteabîta Nû* ya Tolstoy xwend, ji bo çareserkirina pirsgirêkên felsefê yê dijwar ên dabûn ber xwe ronahiyeke nû wergirt û baweriya wî ya bi xirîstîyanîyê rêyeke nû jê re destnîşan kir. Lê belê lazim bû ku ew baweriya wî jî li ser mantiqê xwedî mane be, lê mane ne di nava dinyayê de bes di derveyê dinyayê de bû, ew jî Xwedê bixwe bû; me ew didîtî bes nikaribû bigota û baniya ser ziman (Greisch, 1999:24).

Kitêba wî ya *Tractatus*, bi kurtasî li ser pirsgirêka, ka mirov dê bikaribe li ser çi bi axife û neaxife ye. Ji ber vî jî lazim e ku em pirsê “*zîman çi ye*” yê bidin ber xwe. Herwiha li gorî Wittgenstein –çawa me berê jî îfade kiribû- zîman jî wêneye, wêneya diyardeyan e, çawa diyarde di nava mantiqê de ne, wisa mantiq jî di nava diyardeyan de ye. Mesela heman maşîn, di heman demî de nikare li du cihên cuda xuya bibe. Ev qabul; hem ji bo mantiqê û hem jî ji bo mantiqa diyardeyan lê ye.

Hem rapeyv û hem jî birrahî di nava heman forma mantiqê de ne. Lazim e ku têkiliya wêneyê (zîman) yê, birrahiyê û mantiqê jî bi awayekî mantiqî sererast bibe. Zîman ji wêneyên birrahiyê pêk tînin. Zîman ne tiştêkî bixwe û serbixwe ye, ew tiştêkî wek wêneye, wêneyên birrahiyên cihê dide dest, ew wek kargînekê ye. Û sînorên zîman jî sînorên raman in. Em nikarin xwe derbasî derveyê pêkaniya mantiqê bikin, em nikarin xwe derbasî derveyê pêkaniya zîman bikin.

Ber bi mîstîsîzmê ve

Zîman ji bilî diyardeyan tu tiştî ji me re nabêjin, ew wêneya wan e. Ev jî dide nîşan ku dê hinek tişt nikaribin bînin gotin. Lê mixabin *Tractatus* bixwe jî ji wan tiştên ku nayên gotin tê hesabê (wekî tiştên mîstîk). Wittgenstein jî vê nakokiyê haydar bû û paşî qebûl kir ku *Tractatus*, li ser tiştên tînin nîşandan lê belê nayên gotin hatiye nivisandin (Wittgenstein, 1996:9).

Li gorî Wittgenstein xwedê jî, ji wan tiştên ku nayên gotin tê pejirandin lê belê:

“Bi rastî jî, tiştên ku nakevin nava peyvan henin, ew xwe îsbat dikin, ew ên mîstîk in
(Strathern, 1998:38).

Wittgenstein, filozofekî wisa xuya dike ku gotiyê *hinek tişt nayên gotin, divê li ber van tiştên nayên gotin em hişbibin*, bes ewî bixwe li ser van tiştên nayên gotin tiştan gotiyê. Ewî jî vê nakokiyê qebul kiriye û jixwe di pêşgotina xwe ya

kitêbê de îddîa dike ku, ji ber ku tu tiştêki negotiye, negotina van tiştan ji îsbat kiriye.

Lê dîsa ji bandora wî mezin bû. Felsefevanên analîtîk ku ji wan re dibêjin "Derdora Viyanayê"; gotin ku rastiya rapeyvê bi metodê ve girêdahî ye. Herwiha du cureyên rapeyvên rast henin: A ewil rapeyvên tolojîk in, em biresera rapeyvê didin ber kirdeyê û encam jê derdixin. Mesela ku em bêjin "deh kem didu heşt e", ev rapeyv rast e. A diduyan ji ew e ku rapeyv wêneya rastiye dide nîşan e, mesela em bêjin "vêga di destê min de kitêbekê heye", û birra ji kitêbê hebe ev rapeyv ji rast dibe. Eger ku em nikaribîn bi van awayan gotinekê rast bikin, ew gotin tewş dibe, bêmane ye û nayê rastkirin, da ku rapeyvên metafîzîk tev wisa nin.

Tractatus a pirtûka Wittgenstein di nava felsefevan û filozofên wê demê de gellek deng dabû û bi taybetî ji di nava filozofên li Viyanayê bûn gelek alîgirandin. Di nava vê nofa felsefevanan de, ku m ego ji wan re dibêjin "Derdorên Viyanayê"; pirtûka Wittgenstein gelek hatibû pejirandin û li serî, di nava xwe de nîqaşan dikirin û li gorî wan jixwe ev pirtûk pîrsgirêka felsefê ya epîstemolojîyê çareser dike. Herwiha rêbaz, dê pozîtîvîzm bibûya û ev perspektîfa pozîtîvîst, ku ji mêj ve ji aliyê hinek xwediremanan ve hatibû der; ji aliyê Wittgenstein ve hatibû edilandin, hatibû gihîştina asta xwe ya dawî û herî zelal û mîsoger.

Li gorî lêkolînerên li ser felsefeya analîtîkê jî, ji rave û têgihîştinên xelet ên li ser vê kitêbê ew, wekî "kitêba pîroz a pozîtîvîzmê" hatiye nixandandin (Altiöners, 2008:33).

Lê belê van kesan gava ku Wittgenstein nas kirin û rûbirû pê re xeber dan, tiştên qet jê hêvî nedikirin jê seh kirin û dîtî ku felsefeya wî ya ku heta wî wextî dizanibûn kêm bû û dibûya ku ne rast bibûya jî. Lewre wek mînak Wittgenstein digot ku "tiştê nehênî ne çawabûna dinyayê ye; hebûna wê ye" (Wittgenstein, 1996:169) (Digel vê yekê, ev felsefevanên analîtîk ên wê caxê; jixwe epîstemolojîya xwe li ser "çawa" bûna dinyayê ava kiribûn) û herwiha Wittgenstein îddîa dikir ku tiştên di nava Tractatusê de nehatibûn gotin – an jî nikaribûn bihatina gotin- ji tiştên ku di nava wê de hatibûn gotin girîngtir e. Mirov digot qey tiştên di nava vê pirtûkê de hatine îfadekirin ji bo girîngiya wan tiştên ku di pirtûkê de nayên îfadekirin bide nîşan, hatine nivisandin.

Tiştê nehênî çi ye? Em dikarin bêjin ku tiştê nehênî di literatura Wittgenstein de wek "ên ku nayên ziman", "ên ku nakevin nava ziman" in. Lewre ewî, di rapeyva xwe ya 6.522'an a di Tractatus de "Hemin ên ku nayên ser ziman henin. Xwe didin nîşan; evê ha nehênî ye". Em dikarin bêjin Wittgenstein îddîa dike ku: 1) Em tenê dikarin li ser tiştên diyarde xeber bidin. 2) Xeberdana li ser van diyardeyan tu pîrsgirêk çareser nake, li dijî wî pîrsgirêkan diafirîne. Tiştên em dikarin li ser wan xeber didin ne ewqas hêjayî ne ku em li ser wan xeber bidin, jixwe "xeberdan" ne xeberdan e. 3) Xeberdan wekî lîstîkekê ye, em li ser wan teseltiya gotina tiştan dikin; ne ku

tiştan dibêjin. 4) Ziman tişteki nabêje lê belê gelek tiştan dide nişan 5) Tişteknegotina ziman ji me re nişandana nehênîtiyê ye -ku ew qada nehênî tenê tê nişandan-. 6) Naxwe tiştên biwate (diyarde) ji me re tişteki nabêjin û herwiha ew lazim in lewre ev qada watedar xwe dike û bala mirovan dikişîne ser qadeke din. Yanê dibe wek cangoriya watedariyê, lê ew bixwe ne watedar e. 7) Ev ji me digihîne asteke wisa ku li ser wê derê tişteki nayê gotin û wê derê cihekî mistîk e.

Jean Greisch, ji bo cudahiya navbera “Derdora Viyanayê” û Wittgenstein rave bike, ji ser zimanê Paul Engelmann vanî vediguheze: “Ferqa navbera “Derdora Viyanayê” û Wittgenstein de, ji vî pêk tê: Ji bo vanên ewil, tişteki ku di derheqê wî de hiş bibin tune. Ji wan werî tiştê herî girîng a jiyane, tiştê em li serî dipeyîvin in; bes Wittgenstein bi bengîni îddia kiribû ku li ser tiştê girîng em mecbûrê hişbûnê ne. Mantiqparêzên pozîtivist(Derdora Viyanayê) ew kesin ku, wekî li giravakê ne û ew girav ji her aliyên xwe, bi avên okyanusê hatiye dorpêçkirin. Tiştê ji bo wan ê girîng tene ew e ku, ji bo menfeatgirtina wê derê, li derdora giravê bigerin û pîvandina firehiya axa wê ya ku xwediyê wê ne bikin. Wittgenstein jî li heman giravê dimîne bes tiştê ewî bala xwe avêtiye serî keşifkirina destpêka okyanusê, ango keşifkirina wî tiştê mistîk e. Li gorî Wittgenstein tiştê tewş ew e ku, li ser destpêka okyanusê tê xebirdan û digel mulkiyeta wê okyanusê ne mumkin e bikeve destê tu kesî jî, bi aweyekî metafizik li serî gotinê kirin(Greisch, 1999:39).

Ziman dikare li ser diyardeyan xeber bide lê belê nikare li ser mantiqa wan xeber bide. Herwiha mantiqa rastiyê nayê temsilkirin, nayê îfadekirin û em dikarin bêjin nayê zanîn jî. Lewre ji bo îfadekirin û temsilkirina rastiyê lazim e ku em li derveyê wê bin.

“Nêrîna min a bîngeh ew e ku, sabîte yêni mantiqê bi tu aweyî nayên temsilkirin. Yanê mantiqa diyardeyan nayê ser temsilkirinê” (Wittgenstein, 1996:51).

Ji bo temsilkirina şeweya mantiqê, lazim e ku em bi rapeyva xwe ve, xwe derînin derveyê mantiqê, yanê derveyê dinyayê” (Wittgenstein, 1996:61).

Belê em nikarin rastiya wî temsîl bikin, mantiqa wî bînin ser zimanê belê ew mantiq di nava ziman de xuya dibe. “Rapeyv, şeweya mantiqê nikare temsîl bike, bes şeweya mantiqê şewq dide serî. Tiştê şewq daye nava ziman bi ziman nayê îfadekirin” (Wittgenstein, 1996:61). Ji aliyê din ve tiştên tîn ser ziman(diyarde), hebûn û mantiqa xwe ji wê tiştê nayê ser ziman distîne, bi vî şeklê xwe yê tîn ser ziman, bal dikişîne ser tiştên nayên ser ziman. “Tiştên di nava ziman de tê derbirin, bi ziman nayê derbirin” (Wittgenstein, 1996:61).

Em nikarin ji nava ziman derkevin lewre ew sînora xwe ye. Dide nişan ku birahî ne ji van tiştên li serî tîn xebirdan pêk hatiye. Dinya, hêjahiya xwe ne ji xwe distîne, lewre her tişt di nava wî de tesadufî ye, eger em li pey tiştê nesadûfî bin divê em ji nava wê derkevin.

“Di mirinê de jîyan naguhere, disekine” (Wittgenstein, 1996:167).

Herwiha ziman, me digihîne ji ziman û wir ve. Ziman, ji bo derbasbûna ziman û wir ve heye. Em dikarin li ser tiştên li serî nayên xebardan bifikrin lê belê em nikarin li ser tiştên li serî nayên fikirandin xeber bidin.

“Meyla ber bi mistîkiyê, ji dilxwaziyên me yê ku ji aliyê zanistiyê ve nayên tatmînkirin pêk tê. Eger ku hemî pirsên mumkin ên zanistî bêtin bersivandin jî em ê hizir bikin(bibînin) ku hiç nehatine ser pirsgirêkên me. Bes wî wextî pirs namînin û jixwe bersiv jî ev e” (Wittgenstein, 1996:169).

Çawa ku piştî silmek karê me dibîne, karê me pê xelaz dibe û em jî piştê davêjin; herwiha ev pirsgirêkên me jî wisa nin. Felsefe, gazî hişbûnê dike, gazî fêhmkirina bi hişbûnê, pêdiviya hişbûnê û gihîna asta hişbûnê dike. Lewre tiştê em li serî xeber didin û ji hev re dibêjin tewş in.

“Rapeyvên min bi vî rengî dide xuya ku, kesekî min fêhm bike dê bibîne ku ew tişt tewş in. Gava ku ji wan borî, raserî wan bû –dê bibîne-...” (Wittgenstein, 1996:171).

Jixwe di mistîsîzmê de jî ev xal gelek girîng e û aslê wê de, hatiye pejrandin ku Xwedê di naveroka tiştan de û navan de heye. Ji bo gihîştina Xwedê, lazim e em dev ji peyvan berdin(discours), mirov âncax bi ceribandineke mistîk dikare wî hizir bike. Ne bi peyvan, bi hal. Her tiştî yekane ye, li ser yek rêgezêkê ye, ji Yek pê ve tişteki tuneye û ev Yek jî, ji xwe nayê gotin, nayê ser ziman. Hinek mistîk ewqas îddîa bi pêş ve birine ku gotine “tiştê em didin nişan, nezanîna me ya li ser wî ye, bêîmkaniya me ya xebardana li ser wî ye.”(Hadot, 2004:24).

Angelus Silesius jî gotibû ku “Bi hişbûnê tê xebardan. Ey insan, eger tu bixwazî hebûna ebediyetê bibêjî; lazim e ewil dev ji hemî peyvan berdî”(Hadot, 2004:43).

“Tractatus di mistîkê de diqede. Herwekî sê pêkhatiyên wî henin: Hêsta hebûnê, tevahiya bi sinor û hêsta tiştê nayê îfadekirin; yanê tiştê ji ziman û wir ve. Ev hersê pêkhatî, birastî; bi sê awayan îfadekirina yek armancakê ye: Di nava dinyayê de û bi sinorên ziman ve; bêîmkaniya watekirina tevahiye û hebûnê”(Hadot, 2004:42).

Di vê danê de filozof êdî nêzikê mistîsîzmê bûbû. Mijara wî ya sereke êdî ne dinya tenê bû, hebûna wê bû jî. Ev hebûn ji dinyayê ve nedihata ravekirin, çareser nedibû, tiştên diyarde li ser qada diyardehiyê, li ser mîsogeriye runediniştin. Li pey agahî û zanahiya metafîzîkê bû:

Ewî bi awayekî balkêş xwe ji medeniyeta Ewropayê dûr didit û xwedê giravê wî, jê hez nedikir. Bi me jî tişteki balkêş e ku Wittgenstein bi rastî ne li ser şopa felsefeya Ewropayê çûye, dualîte û nakokiyên giran û xuya yê di nava

kevneşopiya felsefeya Ewropayê, di nava sistema felsefeya Wittgenstein de zahf cih negirtiye. Jixwe ewî jî vê yekê gotiye:

“Ez jî meyla medeniyeta Ewropayê re qet nêzîkahî nabînim û ez armanca wan jî fêhm nakim; eger armanca wan hebe”(Strathern, -ji Wittgenstein-1998:62).

“Ji mirovên bilind re ferq nake ku, ka dinya çawa ye; lewre xwedê di nava dinyayê de xwe der nade”(Strathern, -ji Wittgenstein- 1998:68).

“Pirsgrêka mezin -a ku tiştên min nivisandîye hemî li dora wî geriyane- ev yek e: Gelo di dinyayê de pergaleke a priorî heye û eger hebe jî çi pêk tê?”(Bozkurt.-ji Wittgenstein- 1998: 233).

Li gorî Wittgenstein ziman girîngiya xwe ne jî tiştên ku îfade dîke distîne, yanê ziman ne jî bo tiştên dibêje girîng e, ew jî bo tiştên nişanî me dide girîng e û ew tiştê ku nişanî me dide jî mistîk e. Ziman bi giştî taybetiya xwe, jî nişandana tiştên nayên ser ziman distîne(Bozkurt, 1998: 236).

Bawerîkirina Xwedayekî, têgihîştina pîrsa li ser wateya jiyane ye.

Bawerîkirina Xwedayekî, dîtina ku diyardeyên dinyayê ne dawîya meselê ye.

Bawerîkirina Xweda, dîtina wateya jiyane ye.

Dinya jî min re hatiye dayîn. Ango viyana min, çawa ku tiştêkî li wir be û diçe tevî wî dibe, bi temamî jî derve ve tevî wî dibe.

(Hincar viyana min çi ye, ez hêj nizanim)(Wittgenstein, 2004:93).

Lîstoka Ziman

Li gorî hinek dîrokasên felsefê, Wittgenstein maneyeke taybet daniye ser ziman û ew jî ev e: Peywira ziman, tenê ne binavkirin yan jî nişandana tiştan û yan jî îfadekirina ramanan e; her wiha têgihîştina hevokêkê, jî gorî ku em zan dikin bêtir dişibe têgihîştina mijareke muzîkal. Hema bêje hemî, ziman tune ye bes lîstoka ziman heye ku çawa Wittgenstein jî gotiye; her daîm li ser karîgeriyeke kifşe, li ser rewşeke girgîn û yan jî şiklekî jiyane rudinê(Hadot, 2004:11).

Wittgenstein di serê xebata xwe ya felsefî yê li ser ziman de, tîkiliya navbera ziman û birrahiyê wekî tîkiliya navbera wêneyekê û birrahiyê dida nişan û herwiha wateyê jî bi şertê temsîlîkirina birrahiyê ve girêdida. Wate, di nava hevokê de eger ku temsîlîkirina birrahiyê hebûya hebû û tiştên ku dihatina temsîlîkirin jî tenê diyarde bûn. Çawa ku mirov tenê diyardayan dikare li ser pîvana birrahiyê biceribîne wisa jî tenê gava ku li ser diyardayan diaxive dikare rewşa wêneyê li dar bixe. Ango çawa ku nikare wêneya ne-diyardeyan li dar bixwe wisa jî nikare li ser wan xeber bide.(Altınörs, 2003:131) Lê belê paşî Wittgenstein çawa ku me berê jî go, nêrîna xwe ya li ser vê mijarê pêşvetir bir û ziman wekî lîstokekê û çalakiyeke li ser jiyane nixand:

"Tiştê ku bi îfadeya "lîstoka ziman" tê qedskirin ew e ku; axaftina bi zimanekî, perçeyeke çalakiyekê û perçeyeke forma jiyanekê ye"(Wittgenstein, 2007:32).

"Dayîna fermanan û bicîanîna wan, taswîrkirina(nimandin) xuyahiya objeyekê yan ji pîvana wê, xeberdana buyerekê, spekulasyonkirina li ser buyerekê, çêkirina rawêjekê û kontrolkirina wê, nişandana encama ceribandinekê li ser tabloyan û bi xanxankan, afirandina çîrokekê û xwendina wê, lîstik lîstin, gotina stranan, henekkirin, ji hev derxistina problemeke arîtmîk a pratîk, wergerandina zimanekî bi zimanekî din, pîrsîn, spaskirin, jêxeberdan, hevsilavkirin, duakirin."

Ji aliyê gelek lêkolînerên li ser Wittgenstein xebitîne hatiye pejirandin ku nêrînên filozof a li ser felsefa ziman ên di "Tractatus"(di sala 1918'an de hatiye weşandin) de hatine îfadekirin û yên di "Lêpîrsînên felsefî"(di sala 1953'yan de hatiye weşandin) de hatine îddiakirin ji hev cihê ne. Li gorî Feyerabend, cihêtiya "Lêpîrsînên felsefî" yê ji Tractatusê ew e ku, nêrînên di Tractatusê de hatine derbirin, di yê din de li ser hinek warên girgîn ên jiyanê wekî hatine sepandin.(Altuğ, 2008:150) Ferqa ewil a di navbera van de; di Tractatusê de zimanê ku qadeke cihê, taybet û birêkûpêk hatibû derbirin; di Lêgerînan de guheriye û wekî "lîstokên ziman" hatiya binavkirin û rasterast ne bi yekhêl û yekwateyî û mantiqêke rastedûz hatiye nişandin. Lê dîsa ji filozof, bi rastî di her du danên xwe de ji li ser pîrsa "gelo hevokek çawa dibe xwediyê wateyê?" sekiniye: Hevokek dikare tiştêkî çawa bibêje?

Ji bo lêpîrsînên li ser wateyê ev rêgez derketiye holê: Eger ku hevokek xwedîwate be, tiştêkî ku wê hevokê dike xwedîwate heye. Vaye li vê derê, yanê li ser wî *tiştê* ku hevok pê dibe xwedîwate; ferqa di navbera Wittgensteînê ewil û yê paşî de derdikeve. Li gorî Wittgensteînê ewil ev *tiştê* ku wate di navê de lê tê gerandin *birrabi* ye lê belê di dana paşî de, yanê di Lêpîrsînan de ev yek, çalakiyên mirovan ên cihêreng ên di nav jiyanê de ne. Tiştê ku ziman dike ziman êdî yekhêl nîne:"Lazim e em xwe ji wî fikra ku ziman têxe nava yek kargînê û wî daîmî li ser yek armanc û yek fikrê dinirxîne; ji binî dûr bigrin"(Wittgenstein, 2007:120). Herwiha gelek peyv, bi binyat û kargînên xwe ji hev cihê ne, di nava ziman de hene û em nikarin van di bin yek banî de bi cih bikin. Filozof dixwaze ku em ziman bişibînin qutiyeke hacetan: "Di wê qutiye de çakûç, kelbetan, birrek, tornevida, gonye û zemq henin. Vaye kargînên peyv, di nava ziman de wekî van hacetan ji hev cihê ne(Wittgenstein, 2007:27). Wî çaxî em ê bikaribin bêjin ku wateya peyvyan bi emilandina wan ve girêdahî ye.

Sedema ku filozof ji ziman re gotiye "lîstik", ji şibîna navbera ziman û lîstikan de hatiye qebûlkirin pêk tê. Lewre ev rewşên em ji wan re dibêjin lîstik; her çiqas di bin bana "lîstik"ê de li cem hev bin jî, ji aliyê enstruman û qaîdeyên xwe yê xweru ve, ji hev cihê ne. Wekdin lîstik û xeberdan jî dişibin hev. Gava em dilîzin, bi hacet û îmkânên di destê xwe de em xwe, çawa ku tiştêkî bikin dihesibînin. Mesela, gava zarok bi xanîkan dilîzin, xwe wekî ku

xwediyên xaniyan bin dihesibînin. Yanê, xanî tune ye lê belê wekî ku hebe miamele pê tê kirin. Lîstik ev e. Eger ku ziman jî bi vê mînakê bê watekirin, em ê bikaribin bêjin ziman wekî lîstikekê ye li ser tiştan. Çawa ku em li gorî dilê xwe wan tiştan berhev dikin, wate davêjin ser wan û herwiha çawa ku ev tiştê em dikin rast bin, em wan rast dihesibînin, ziman jî wî çaxî dibe wekî lîstik.

Filozof, li cihêkî din jî ziman, dişibîne malbatê û endamên malbatê: “Ji bo van manendan karekterîze bikim, ji mînaka malbatîyan çêtir tişteki nayê bîra min; lewre manendiyên cihêreng ên di nava malbatîyan de; wekî teşeyê, rudeynê, rengê çavê, aweyê rêveçûnê, tebietê hwd. di nava wan malbatîyan de wekî li hev tîn lefandî û hev digirin in. Ez ê vî bêjim: Lîstik, malbatekê çêdike”(Wittgenstein, 2007:52). “Herwiha wisa xuya ye ku, axaftina ziman, pariyeke ji çalakî û aweyê jîyanê ye” (Wittgenstein, 2007:32). Maneya peyveke, ji şert û mercên hawîrdorê û viyana bikaranîna wê pêk tê. Çawa ku kevîrên sêtirincê, maneya xwe ji bikaranîna xwe ya di nava lîstikê de pêk tînin distînin, wisa jî peyv, bi maneyên xwe ne xweru ne, ji awe û niyeta bikaranîna xwe ya di nava jîyanê û hevokê de distînin. Mane bikaranîna e. Ne peyv wateyê dide tiştan, bi bikaranîna peyvvan mirov wateyê davêje ser tiştan. Serqîsse Wittgenstein, ku di Tractatusê de wateyê bi formulasyona teoriya wêneyê nîşan dabû- paşî, di Lêgerînên Felsefî de bi pêş ve dibê û wateyê bi karanîna ve girêdide.

Em dikarin bêjin, guhertina nêrîna wî ya li ser vê mijarê li ser van herdu xalan tê îfadekirin:

- 1) Wate, berê yekparî bû û di nava ziman de(ziman jî wêne bû) xuya dibû lê belê vêga wate “bikaranîna” e, çendparî ye û di nava aweyên çalakîyan de xuya dibe(Magee, 2008:336). Ziman, êdî ne wêneye, lîstik e.
- 2) Wittgenstein, berê, îddia dikir ku binyata birrahiyê binyata ziman ava dikir û çêdikir. Lê belê dikare bê gotin ku paşî dev ji vê nêrîna jî berda û wateya ziman, bi helwesta çalakîyan ve girêda. Herwiha objeyê ji navendê rakir û sujeyê xist şuna wê.

Bi vî rengî ew, em dikarin bêjin li hemberî sê nêrînan derdikeve: A ewil, nêrîna wî ya kevn e ku ziman wekî wêneyê dinirxand. A diduyan, li hamberî nêrîna ku wateya peyvvan bi îdeyên di nava zêhnê ve girêdabûn derdikeve. Û a sisêyan jî ew li dijî nêrîna ku ji bo peyv bibin xwedîwate lazim e ew xwedîyê ruçikê bin, derdikeve.

Ziman, çalakîyekê ji çalakîyên mirovan e. “Koka lîstoka ziman û teşeya wî ya hoveber bertekekê ye... Ez dixwazim vî bêjim: Ziman narîniyekê ye, serê ewil çalakî hebû”(Wittgenstein, 2009:157). “Peyv, çalakî ne”(Wittgenstein, 2009:176).

Peywira felsefê:

Li gorî wî, peywira felsefê ravekirina ramanê û eşkeretirkirina nêrîn û ronahîkirina asoya mirovahiyê ye. Encameke girîng ku lazim e em ji serpêhatiya felsefê derxin ew e ku; helwesta têgihîştina mirovahiyê, her daîm serê xwe li diwarî ziman daye û bi vê lêdanê di serê wî de gulpik çêbûne û herwiha felsefe, van gulpikan nişanî me dide (Atak, 2010:118). Wittgenstein ji bo armanca felsefê wiha gotiye: *Rênîşandana mêşa di nava qebanozê de ku dixwazê ji navê derkeve*. Bi vî rengî folozafan dişibîne wê mêşa di nava qebanozê de ku rêya xwe winda kiriye lê belê pê nehisiyaye. Nizane serê wî li ku dikeve û eslê meseleyê çi ye. Kengê dixwazê bifire, serê wî li camê dikeve û dikeve erdê. Ji ber ku filozof ji bi sînoren ziman nehisiyanê û pê nizanin daîm li wê sînorê dikevin û bi pêşvetir ve naçin. Mêş, bi camê nahise filozof ji bi ziman (Atak, 2010:120).

Bi vî awayî pirsgirêkên felsefî ne bi helwesta eşkerekirina ruçika objeyan û dehurandina qada diyardeyan tên çareserkerin bes ew bi aweyekî mantiqî-matematîkî û bi analîzkirina têgihan û ziman tên ravekirin (Bozkurt, 1998:228). Em dikarin bêjin ku li vê derê êdî ne obje, peyv û têgih girîng in.

Felsefe, rapeyvan danayne bes rapeyvan rave dike. Li gorî wî pirsgirêka felsefê ya herî girîng ji ev e: "Tiştê herî girîng, teoriya li ser ê ku bi rapeyvan, yanê yê ku li ser ziman tên îfadekirin û yên ku li ser ziman nayên îfadekirin lê belê tenê tên nişandan e. Ez vî, wek pirsgirêka felsefê ya sereke dibînim." ... "Peywira felsefê çêkirina zimanekî îdeal nîne; ravetirkirina zimanê me yê ku em bi kar tînin e." (Bozkurt -ji Wittgenstein- 1998:234).

Çawa ku qadên jiyane û tekiliyên me yên pê re hemî ne li ser yek awayî ne û zimanê me wekî listikekê ye, em bi navgîniya zimanê xwe van xwedîwate dikin, lazim e ev qadên ji hev cihê ji cihên hev negrin. Ango mesela li ser meseleyeke olî, em ê nikaribin bi rêbaza axaftinên me yên li ser meseleyeke zanistî biaxivin. Gava ku evan di ziman de cihên hev girtin û tevlihev bûn wê gavê felsefe dibe xwedîpeywir. Lewre li gorî filozof "pirsgirêkên felsefî gava ku ziman derdikeve betlaneyê derdikevin" (Magee, 2008:348) ji ber vî, divê em bizanibin ka em ziman çawa bikartînin. Û em bizanibin gava ku me ziman xelet bi kar anî, wê gavê pirsgirêk derdikevin. Ango pirsgirêk ne çiyîna heqîqetê an jî îfadekirina heqîqetê bi zimanekî transcendentale bes pirsgirêk xeletiya bikaranîna ziman e.

Bi kurtasî, peywira felsefê analîzkirin û ronahîkirina ziman û rapeyvan e, fonksiyon û bikaranîna wî ye (Altınörs, 2003:51). Haceta zanîne ziman e û ziman bi serê xwe me nagihîne heqîqetê. Hûn ji dibînin ku li vê derê em wekî, bi şekparêziyê nû rubiru dimînin û bi rastî hinekan gotine ku jixwe Wittgenstein nunêrê vê şekparêziya nû ye (Kripke, 2007:86). "Wittgenstein şekparêziyê nû edilandiyê. Ez bixwe li ser wê meylê me ku, felsefeya wî wekî şekparêziyê, pirsgirêkeke xweru û ji aliyê hişkê kêmdîtî ve hatiye afirandin binirxînim (Kripke, 2007:87).

Filozof, ji cihekî û pê ve, xwe êdî ne li pey afirandina teoriyan û destnîşankirina wan dihesiband; bes li ser teknîka felsefevanek û li ser têgihîştina ku, ka dê felsefe çawa bê bikaranîn disekiniya (Monk, 2005:429).

Li ser vê xalê peywira filozof a ku Wittgenstein daye nîşandan, ji aliyên gellek kesan ve li terapiya ku terapîst li ser nexweş dike hatiye şibandin. Çawa ku terapîst –jixwe vê peyvê ewî bixwe jî bikaraniye-, em bêjin li ser nexweşek nevroîtîk terapî dike, bi wê terapiyê sedemên semptomên ku nexweş dide nîşan ji bin hişê dixwaze derxe ser hişê û tedawî bike; wisa jî filozof lazim e ji pirsgirêkên mirovahiyê ku ji xeletiya bikaranîna ziman û xeletiya têgihîştina mantiqa ziman pêk hatine derxe holê û sererast bike (Magee, 2008:353).

Filozof ew e ku, ji bo xwe bigihîne nosyonên hişê asayî, di bin zora başkirina illeten xwe yê têgihîştini de ye (Wittgenstein, 2009: 174).

Çavkanî:

- Altınörs, Atakan. 2008. *Analitik Felsefe*. İstanbul: Say Yayınları.
- Altınörs, Atakan. 2003. *Dil Felsefesine Giriş*. İstanbul: İnkılap Yayınları.
- Altuğ, Taylan. 2008. *Dile Gelen Felsefe*, İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.
- Atak, Seyit Ahmet. 2010. *Ludwig Wittgenstein'in Felsefe ve Filozof Kavramlarına Bakış*. Diyarbakır: Sosyal Bilimler Araştırma Dergisi.
- Bozkurt, Nejat. 1998. *20. Yüzyıl Düşünce Akımları Yorumlar ve Eleştiriler*. İstanbul: Sarmak Yayınevi.
- Greisch, Jean. 1999. *Wittgenstein'da Din Felsefesi*. Bursa: Asa Yayınları.
- Hadot, Pierre. 2009. *Wittgenstein ve Dilin Sınırları*. Doğubatu.
- Kripke, Saul A. 2007. *Wittgenstein, Kurallar ve Özel Dil*. İstanbul: Litera Yayıncılık.
- Magee, Bryan. 2008. *Büyük Filozoflar: Platon'dan Wittgenstein'a Batı Felsefesi*. İstanbul: Paradigma Yayınları.
- Strathern, Paul. 1998. *90 Dakikada Wittgenstein*. İstanbul: Gendaş Yayınları.
- Monk, Ray. 2005. *Wittgenstein: Dâbinin Görevi*. İstanbul: Kabalacı Yayınevi.
- Utku, Ali. 2009. *Ludwig Wittgenstein Erken Döneminde Dilin Sınırları ve Felsefe*. Doğubatu.
- Wittgenstein, Ludwig. 2007. *Felsefi Soruşturmalar*. İstanbul: Metis Yayınları.
- Wittgenstein, Ludwig. 2004. *Defterler, 1914-1916*. İstanbul: Birey Yayıncılık.
- Wittgenstein, Ludwig. 2001. *Tractatus logico-philosophicus*. İstanbul: YKY
- Wittgenstein, Ludwig. 2009. *Kesinlik Üstüne+Kültür ve Değer*. İstanbul: Metis Yayınları.

Ferhengok:

- Aso:** Ufuk
Bengî: Tutku
Bertek: Tepki
Binêhiş: Bilinçaltı
Cihêreng: Çeşitli
Cure: Çeşit
Derdora Viyanayê: Viyana Çevresi
Dersirûştî: Doğaüstü
Gulpık: Yumru
Hişê Asayî: Sağduyu
Hoveber: Primitif
Jêderanîn: Çıkarım
Karîger: Etkin
Kêmdîtî: Ender
Lê/Nelê: Geçerli/Geçersiz
Mîsoger: Kesin
Nehênî: Gizem/Gizil
Pîvan: Ölçü
Rawêj: Hipotez
Rêgez: İlke
Sepandîn: Uygulama
Serpêhati: Serüven
Şûnde: Uzam
Teşe: Biçim
Xanxank: Çizelge